Li ser masa:

Hevdîtina 2an ya Nivîskarên Êzidiyan

(Li 7 û 8 Nîsanê)

(omêd û daxwazî)

Jena, Sibat 2001, Belê ew bû cara yekemîn ku hemû nivîskarên Êzidî li Elmaniya geheştine hev û li ser masekê rûniştin. Û ji metirsiya karê wan bi tersî neyê famkirin, nikarîbûn navekî li ser rûniştina xwe deyinin, bitir ji navê (Hevdîtina Nivîskarên Êzidiyan). Bêguman rûniştina wan bi xwe jî bes bû. Ji ber em hemû dizanin, berî demeka ne dûr, rûniştineke wisa jî xewnek bû. Lê heke xewnên do bûne rast, em behwerin xewnên îro jî di asoyê sibe de xweya bikin. Xewnek ji wan ewe, heke Hevdîtina Nivîskarên Êzidî bibe faktek ji bo hevkariyê, ne tenê di warê rûniştinê de, lê belê di warê xebata çandî û civakî de. Heke roşenbîrê Êzidî karibe bitir xwe nêzîkî astengiyên civakê bike! Em hemû dizanin valayeke çandî ya mezin di nava me de heye, bi giranî li Europa, vêce heke em karibin wê valayê dagirin! Bêşik, astengiya me di psîchologiya me de ye. Jiber em gelek caran nikarin bi komik kar bikin. Omêda me jî ewe ku komîtên tayibet ji bo vekolîna li ser Êzidîtiyê bên çêkirin û civînên nivîskaran ne global bin, û ne li qalikên meselan bigerin, ji ber pêwîstiya me bi naverokan heye. Hevalekî di got; „Pêwîstiya me bi nivîskarên Êzidîtiyê heye ne bi nivîskarên Êzidî. Lê ez dibînim herdok ji mere pêwîstin, belê divê giranî ji Êzidîtiyê re be. **(bitir r.2)**